Destekdayîna ji bo Mirovan - Supporting People

Em kî ne û em çi dikin.

Destekdayîna ji bo Mirovan (Supporting People) çi ye?
Her roj, di nav civakê de, gelek mirov hene ku ihtiyaca wan bi alîkariyê heye. Belkî, ew dixwazin ku ji xwe re karekî peyda bikin, lê belê, ji bo dîtina karekî riya herî baş nizanin. An jî dibe ku ew nikarin kirêya xwe bidin û ditirsin ku ew ê mecbûr bin ku ji mala xwe derkevin.

Belediya Haringeyê, bi mirovên ji saziyên din re, hazir e ku di derbarî van probleman û problemên din ên dibe ku hun bi wan re rû bi rû bimînin de, ji we re bibe alîkar. Alîkarên din ji van deran in: Weqfa Lênêrîna Sereke ya Hînkirinê ya Xizmeta Siheta Netewî (Haringey NHS Teaching Primary Care Trust) û London Probation Service.

Ji navê vê alîkariyê re Destekdayîna ji bo Mirovan tê gotin. Heke ku problemeke we heye an hun mirovekê/î xwedî problem nas dikin, tevayiya vê nivîsarê bixwînin û lê binêrin ka em dikarin ji we re bibin alîkar an na.

Destekdayîna ji bo Mirovan di kijan aliyan de dikare bibe alîkar?
Em dikarin ji bo van zehmetiyên jiyanê bibin alîkar:

- Hun dixwazin ji xwe re cîhekî ku hun tê de bijîn û li wir mala xwe ava bikin bibînin
- Belkî, hun fikar dikin, ji ber ku we kirêya xwe nedaye. Hun fikar dikin ku hun ê mecbûr bin ku ji mala xwe derkevin
- Hun dixwazin, bi xwe, li xwe binêrin û hewcedarê alîkariya hevalan an malbatê nebin. Hun dixwazin bizanin ka hun vê yekê çawa dikarin bikin
- Belkî ihtiyaca we bi zêdetir alîkariya peran heye an jî hun nizanin ka hun çawa dikarin alîkariya peran bigirin
- Belkî hun bi serê xwe tenê dijîn. Hun dixwazin ku mirovek were û lê binêre ka hun ewle û di nav siheteke baş de ne, an na
- Hun dixwazin ku karekî we hebe. Hun dizanin ku ihtiyaca we bi hîndekariyê û alîkariyê heye ji bo ku hun ji xwe re karekî bibînin
- Belkî jî, hun di nav mala xwe de, xwe, ewle nabînin û hun dixwazin ku alarmek di mala we de bê bicîhkirin ku hun bikarin alîkariyê bixwazin dema ku ihtiyaca we pê çêdibe.

Em alîkariyê didin mirovên çawan?
Heke hun, hevalek an xizmekî we, xwediyê yek ji van problemên jêrîn in, belediye amade ye ku ji we re bibe alîkar.

- Tu derekî we yê ku hun lê bijîn tune
- Ihtiyacên we yên nexweşiya hişê hene
- Hun mirovek kal/pîr in û ihtiyaca we bi alîkariyê heye
- Ji bo hînbûna tiştên nû ihtiyaca we bi alîkariyê heye

- Hun an heval an xizmekî we xwediyê nexweşiya HIV/Aids in.
- Hun ciwanekî/ê ku malbata wî/wê tuneye ne, an hun ji cîhê ku, li wir, li we dihata nêrîn, vediqetin.
- Mirovên ku tiştên li dijî qanûnî kirine an hê jî tiştên li dij qanûnê dikin
- Belkî mirovekê/î di nav malbata we de, bi riya li we xistinê, memelekê xirap li we kiriye, an jî we tehdît kiriye ku ew ê we biêşîne
- Belkî, cînarên we li dij we zimanekî bi nefret an tehdîtkar bi kar anîne
- Dibe ku proplema we bikaranîna madeyên tevzîner an zêdevexwarina alqolê ye
- We ji welatê xwe dev berdaye û hun hatine li vir dixwazin bibin xwedî jiyaneke başţir
- Dêûbavên umir-biçûk pir caran hewcedarê alîkariyê ne
- Belkî problema we, bi rê ve çûyîn, kirina karên nav malê re eleqedar be an jî hun li ser sendelyeke biteker in.
- Belkî hun rind seh nakin û baş nabînin.

Kijan xizmet van alîkariyan didin?
Du celebên alîkariyê hene.

Xizmetên destekê yên guhêzbar/seyar
Ya yekemîn wek desteka guhêzbar/seyar tê binavkirin. Ev destek ji bo mirovên ku di nav mala xwe de, bi serê xwe, dijîn an ji bo mirovên ku li derekî din dijîn peyda dibe. Dibe ku mirov di nav xaniyên belediyê de an di nav xaniyên Housing Association (Komelên Xaniyan) de, an di nav xaniyen ku wan ji sektora xusûsî kirê kirine de bijîn. An jî dibe ku mirov xwediyê xaniyên ku ew tê de dijîn, bin.

Desteka guhêzbar bêpere ye. Hun bi xwe dikarin xwe bighîninê, an jî hun dikarin xwe bi alîkariya mirovek din bighîninê. Heke ku ihtiyaca we bi vê destekê heye, telefonî hejmarên jêrîn bikin.

Ji bo malbatan:
HARTS
☎: 0845 303 2350

Ji bo mirovên li ser 60 saliyan:
Sixty Plus
☎: 0800 652 6100

Ji bo mirovên bi serê xwe yên 15-59 salî an jin û mêrên ku zarokên wan tunin:
Key Support
☎: 020 8347 2327

Desteka guhêzbar ya taybetî peyda dibe ji bo mirovên ji hin civakên etnîk. Ji bo agahiya zêde ya di derbarî vê alîkariyê de, bi li vir re bikevin têkiliyê.
The Corporate Voluntary Sector Team (Ekîba Sektora Dilxwaz ya Yekbûyî)
☎: 020 8489 6913

Ekîba Belediya Haringeyê ya bi navê Safe and Sound wê alarmekê bide we û hun dikarin vê alarmê, di nav mala xwe de, bi kar bînin ji bo ku hun alîkariyê bixwazin dema ku qezayek were serê we an dema ku hun bibin qurbanê sûcekê.
☎: 020 8489 2365 an jî websîteya me ziyaret bikin www.haringey.gov.uk

Metropolitan Care and Repair (Lênêrîn û Temîrata Metropolîtan) jî, ya ku em desteka malî didinê, hazir e ji bo ku alîkariyê bide we. Ihtiyaca we heye ku di nav mala we de tiştek bê temîrkirin? Dibe ku ihtiyaca we di derbarî karên di nav baxçeyê de, hebe. Heke ku seqetiyeke we heye, dibe ku ihtiyaca we bi hin guhertinên di nav mal de, hebe. Ew ê, her wiha, li we şîretan jî bikin di derbarî ka hun çawa dikarin xwe li dij sûcan biparêzin.
☎: 020 8829 8310

Xizmetên bi cîhên li mayînê re eleqedar.
Celeba din ya alîkariya ku hun dikarin bigirin wek xizmetên bi cîhên lê mayînê re eleqedar tên binavkirin. Ev tê vê wateyê ku ev alîkarî, ew cîhê ku hun lê dimînin tê dayîn. Hinek ji van xizmetan wê heft rojên hefte, rojê 24 seet alîkariyê bidin we. Ev alîkarî dibe ku van bihundurîne:

- Xaniyên parastî yên ji bo kal û pîran
- Hostelên destekkirî yên ji bo bêmal, sûcker (mirovên ku li dij qanûnê tiştekê kirine) û mirovên ku ber başbûnê ve diçin piştî ku wan madeyên tevzîner bi kar anîne û zêde alqolê vexwarine
- Mal/xaniyên ewle ji bo mirovên ku li wan memelekê xirap hatiye kirin, li wan hatiye xistin ji aliyê mirovekî di nav malbata wan de
- Xaniyên destekkirî ji bo mirovên xwedî ihtiyacên nexweşiya hişê
- Xaniyên destekkirî ji bo mirovên xwedî seqetiyên hînbûnê
- Xaniyên destekkirî ji bo mirovên xwedî seqetiyên hişê an ên fizîkî. Dibe ku ev mirov zehmetî dikşînin di kirina an eyarkirina tiştan de
- Xaniyên destekkirî ji bo mirovên ku baş seh nakin an baş nabînin
- Daîreyên hindekariyê yên destekkirî ji bo ciwanên ku ji cîhekî li wan dihat nêrîn derdikevin û kesên ciwan ên ku tu keseke ku li wan dinêre tunin.

Hun nikarin xwe bi xwe bighînin van xizmetan. Mirovê/a ku ji bo lênêrîna we berpirsiyar e, an alîkarî dide we, wê, we hewale bike. Mesela, ev mirov dibe ku, karmendeke sosyalê, şîretmedarekî sihetê an tixtorek be. Ji bo agahiya zêde di derbarî vê xizmetê de, bi me re li edresa jêrîn bikevin têkiliyê:

✉: Supporting People Team, 40 Cumberland Road, N22 7SG
☎: 020 8489-3344
@: supporting. people@haringey.gov.uk

Destekdayîna ji bo Mirovan hin xizmetan nade.

Em di derbarî van ên jêrîn de alîkariyê nadin:
- Lênêrîna şexsî an alîkarî di derbarî şûştin û kinc li xwe kirinê de

- Hazirkirina xwarinan, danûstandin/bazarkirin, xwarin pijandina rojane
- Zaroknêrîn
- Lênêrîna sihetê
- Kansilînga taybetî (bi yekî re peyîvin di derbarî probleman de).

Lê belê, heke hun dixwazin bibin xwedî zêdetir agahiyan di derbarî ka Xizmetên Sosyalê yên Belediya Haringeyê çawa dikare alîkarî bide we bi li vir re bikevin têkiliyê:
Social Services (Xizmetên Sosyalê)
☎: 020 8489-0000

Hewce dike ku ez ji bo alîkariyê pere bidim, û ez çawa dikarim giliyê bikim?

Heke ku hun ji du salan kêmtir alîkariyê bigirin, ew bêpere ye. Heke hun ji bo demeke dirêj (ji du salan zêdetir) alîkariyê bigirin, dibe ku hewce bike ku hun ji bo wê pere bidin.

Heke ku hun Alîkariya Kirêya Xanî (Housing Benefit) digirin, xizmet bêpere ne.

Dema ku hun ji bo alîkariyê serî lê didin, ew ê ji we re bê gotin ka hewce dike hun pere bidin an na. Lîfleteke din heye û tê de agahî hene di derbarî ka hun çawa dikarin serî ji bo xizmetên bêpere an xizmetên bihayê wê kêmkirî, bidin. Navê vê lîfletê ev e: “Bihayê Xizmeta min a Destekdayîna ji bo Mirovan çawa tê dayîn” (How is my Supporting People service paid for). Ji kerema xwe ji bo qopyeke vê lîfletê bi me re bikevin têkiliyê.

Heke hun ne memnûn in di derbarî xizmeta Destekdayîna ji bo Mirovan de, vê yekê, ji karmenda xwe ya destekê re an ji menecerê xizmetê re bibêjin. Heke ku hun di derbarî netîceyê de memnûn nînin, bi Ekîba Destekdayîna ji bo Mirovan re bikevin têkiliyê. Her wiha, lîfleteke din heye ku tê de detayên ka mirov çawa qerarekê qebûl nake an ka mirov çawa di derbarî xizmetekê de gilî dike, tên îzahkirin. Ji kerema xwe ji bo qopyekê vê lîfletê bi me re bikevin têkiliyê.

Ji bo zêdetir agahiya di derbarî vê de an heke tu probelemeke we ya din hebe, hun dikarin bi me re bikevin têkiliyê.